

DESTANÊN KURDÎ JI ALÎYÊ TAYBETMENDÎYÊN DIRÛVÎ VE

Hikmettin Atlı

Mardin Artuklu Üniversitesi, Yaşayan Diller Enstitüsü, Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı
bedranh@gmail.com, <https://orcid.org/0000-0002-0868-3294>

Article Types / Makale Türü: Research Article / Araştırma Makalesi

Received / Makale Geliş Tarihi: 24. Ocak 2024 **Accepted / Kabul Tarihi:** 28 Nisan 2024

DOI: 10.26791/sarkiat.1437047

Destanên Kurdî Ji Alîyê Taybetmendiyên Dirûvî ve

Kurte

Xebatên li ser zargotina miletan, ne bi tenê di çarçoveya wêjeyê an jî çanda devkî de ne. Ji destpêka mirovahiye û vir ve, li dû bandora hin bûyerên ku bi jiyana hemî civakê an jî beşeke civakê re têkildar in, hin hikaye hatine gotin ku di mayindebûna van bûyeran de roleke serke leyistine. Ev cure vegotin temsîla hisiyata dewreke civakê dikin û di heman demê de dibin parçeyeke dîroka wan ya devkî jî. Her çendî ku em wan ji dengbêj an hikayebêjan jî dibihîzin, ew ne bi tenê aydê wan in. Ew malê hemî civakê ne û sekna wan ya li hember hin bûyerên taybet nîşanê me didin. Di nava van vegotinên gelêrî de, destan xwedî cihêkî taybet in. Ew li gorî cureyên dî yê zargotinê di temsîlkirina nîrx û dîroka miletan de bêtir derketine pêş. vebêjên van hikayeyan jî, yanê dengbêj jî ji alîyê civak û pêşengên civakê ve her tim bi qedr û qîmet hatine pêşwazîkirin û wan jî di dîwanên beg û mîran de bi rêya van hikayeyan her tim mesaj dane civak û pêşengên civakê. Di vê nivîsê de digel ku li ser pênaseya wê nîqaş hene jî me tenê nîrxandinên xwe di derdora heft destanan de bisînor kirine. Ev destan ev in: *Memê Alan, Siyabend û Xecê, Kela Dimdim, Zembîlfiroş, Derwêşê Evdî û Edûlê, Cembelî û Binefşa Narîn û Kerr û Kulik*. Hiç guman nîn e ku yek dikare li ser destanbûn an ne destanbûna van heft hikayeyan nîqaşê bike. Her wiha hin hikayeyên dî jî dibe ku daxilî vê listeyê bên kirin. Lê em ê nivîsa xwe di çarçoveya van vegotinan de bigirin û jî alîyê dirûvî û taybetiyên vegêranî ve wan vekolin.

Peyvên Sereke: Destan, Dirûv, vegêran, Wêjeya Gelêrî, Kurd

Kurdish Epics in Terms of Their Formal Features

Abstract

Works on the folk literature of nations are not only in the context of literature or oral culture. Since the beginning of humanity, following the impact of some events that are related to the life of the whole society or a part of the society, some stories have been told that have played a major role in the survival of these events. These kinds of narratives represent the feeling of a period of society and at the same time become a part of their oral history. Even though we hear them from singers or storytellers, they are not the only ones. They belong to the whole society and shows us their attitude towards some special events. Epics has a special place among these folk narratives. Compared to other types of folk literature, it is more advanced in representing the values and history of nations. The narrators of these stories have always been welcomed by the society and the leaders of the society, and they have always given messages to the society and the leaders of the society through these stories in the courts of lords and princes. In this text, although there are debates about its definition, we have limited our reviews to around seven epics. These epics are: *Memê Alan, Siyabend and Xecê, Dimdim Castle, Zambilfiroş, Derwêşê Evdî and Edûlê, Cembelî and Binefşa Narîn and Kerr and Kulik*. There is no doubt that one can debate whether these seven stories are epics or not, as a genre. Some other stories may also be included in this list. But we will take our text in the context of these narratives and examine them in terms of their forma and narrative features.

Keywords: Epic, Form, Narrative, Folk Literature, Kurd

DESTPÊK

Wekî cureyeke vegotinên gelêrî destan, di nava civakan de gelek bi nav û deng in. Sedemên vê navdariyê bêguman girêdayî hin taybetmendiyên vê cureyê ne. Ji van taybetmendiyên yê herî giring taybetmendiyên wê yê tematîk û dirûvî ne. Ji taybetmendiyên tematîk mebest ev e ku, fikr û hîsîyatên di destanê de derdikevin pêş me, bi rengekî hemî civakê eleqedar dikin. Her wekî ku gelek zanyarên vê qadê jî destnîşan kirine; ew derbirîna hîs û hestên hevpar, xeyal û hêviyên hevpar yê civakê ne. Eger ku bûyerên di destanê de diqewimin herêmî bin jî bi rêya dengbêjan ew jî sînorê herêma xwe dibuhirin û dibin malê hemî civakê.

Wekî têgiheke zanistî li ser destanê gelek pênase hatine kirin. Di van pênaseyan de carina alîyên şeklî yê wê cureyê derdikevin pêş carina alîyên wê yê tematîk û carina jî ji ber bingeheên vê cureyê hin pênase hatine kirin. Li gorî Valî, destan bermayên vegotina mîtik in. Yanê karakterên ku li vir derdikevin pêş me ji cihana xeyalî ya mîtosê mane û sedema guherîna forma mîte ya ber bi destanê ve jî meseleyeke serdemî ye (Valî, 2021: 21). Keskin jî bi nêrîneke nêzîkê li destanan dinihêre û qeyd dike ku di bingeha destanan de mît hene û ji ber vê yekê tema û naveroka destanan jî bêtir li ser derasayî û lehengiyê ava dibin (Keskin, 2019: 179-180). Valî pênaseya destanê ji M. H. Abrahams wiha neqil dike: Destan vegotinek helbestî û dirêj e, li ser mijareke cidî ku bi awayekî fermî û berz kirî li derdora leheng yan kesayetek niv-xwedayî hatiye vegotin ku qedera eşîr, netewe yan jî nijadekê girêdayê kiryarên wî/wê ye (Valî, 2021: 19) Li gorî Felix Oinas destan; klamên epîk yê gel, hikayeyên helbestî ne ku di heqê serboriyên mirovên ne jî rêzê de bi vegotîneke xemilandî têne gotin. Her wiha Oinas, destanan li gorî temayên wan jî bi vî rengî kategorîze dike: Şamanîstîk, lehengî, romantîk û dîrokî (Oğuz, Teke, Akyaka, 2015: 234, 236). Boratav destanan di radeya herî jorîn de wekî temsîla hîsîyatên giştî yê civakê dibine û bêtir di çarçoveya temayên lehengiyê de lê dinihêre. Li gorî wî di destanan de dijberî ne di navbera civakê bi xwe de ye lê di navbera du civakan an jî civak û xwezayê de ye. Lehengên destanan jî serkêşên civakê ne ku vê micadeleyê di asta herî bilind de temsîl dikin. Li gorî Boratav destan cureyke edebî ya zumreya arîstokrasîyê ye (Boratav, 1989: 57-70). Destan jî wan berhemên helbestî re tê gotin ku behsa derasayî an jî rastiyê dikin, efsane û dîrokê bi hev dikelîjînin, hin bûyerên mezin yê civakî bi rengekî helbestî vedibêjin (Artun, 2001: 25)

Wekî ku em ji van pênaseyên jorîn jî têdîgihên, cureya destanê ji gelekî alîyan ve hatiye pênasekirin. Herwiha li gorî van pênaseyan hin cureyên ku em wan wekî destan bi nav nakin jî dikarin wekî destan bêne hesibandin û hin cureyên ku em wan wekî destan bi nav dikin jî dibe ku wekî destan neyên qebûl kirin. Di van pênaseyan de alîyên dirûvî û tematîk û binyadî ya vê cureyê derketine pêş. Bi ya me di destpêkê de ji bo ku em ji vegotîneke gelêrî re destan bibêjin lazim e ew xwedî avanîyeke çîrokî/hikayeyî be. Yanê tê de kompozîsyonek hebe. Destpêk, geşedan û encam hebe. Wekî mînak hinekî klam hene ku ji alîyê dengbêjan ve têne stîrîn lê hikayeyê wan tune ye. Tenê rewşî ne. Taybetmendiyêke di ya destanan ev e ku ew ji alîyê dirûvî ve helbestî ne. Eger di destanê de pasajên helbestî nemabin, êdî wesfîyeta destanî ya wê vegêranê hatiye hundakirin. Wekî mînak çîrokên Mala Zalê û Mîrze Miheme, ji alîyê temayên xwe ve bi tevahî destan in. Lê ji ber ku bi piranî taybetmendîya wan ya helbestî nemaye em nikarin wan wekî destan bihesibînin (wekî îstîsna li hin herêmên rojhilatê Kurdistanê û Kafkasyayê hin varyatnên menzûm yê Rustemê Zal hene). Lewre ew ancax helbestî bin dikarin ji alîyê dengbêjan ve bêne xwendin. Ji alîyêkê di ve em dikarin vê şîroveyê bikin; ji ber ku dengbêjê êdî wan naxwînin, ew wesfîyeta xwe ya helbestî hunda dikin. Li vê derê li gorî vê şîroveyê em dikarin tesbîteke wiha ji bo destanên kurdî bikin ku li ser rewşa wan ya cureyî bandoreke giring ya vebêjan angî dengbêjan heye.

Destan bi piranî helbestî ne lê destanên ku helbest û pexşan tevlihev in jî hene (Kaya, 2007: 221) Di destanan de hêmana vegêranê bi tenê li ser helbest an jî klamê ava nabe. Di navberê de pasajên pexşan jî hene ku ev taybetiyêke giring ya destanên kurdî ye. Lewre ev reng dirûvîhîlgirtin ji stîla denbêjîyê tê. Ji ber ku destan li gorî cureyên di gelekî dirêj in, zehmet e ji bo dengbêjan ku hemî destanê bi rengê klamkî neqil bikin. Loma bi taybetî di pasajên destpêkê de, di beşa geşedanê û di encamê de vegêrana pexşankî derdikeve pêş me.

Ji pênaseya jorîn ya Oinas em dibînin ku di heqê vegotin an jî vegêrana van cure hikayetan de tê gotin ku ew xwedî uslûbeke xemilandî ne. Yek ji pîrsgirêka giring ya di heqê cureya destanê de ew e ku pîrî caran tê gotin ku derasayî divê tê de hebe. Lê hem jî dema peydabûna vê cureyê û hem jî ji civata ku ew cure lê tê îcrakirin em dizanin ku her çendî ku di van cure vegotin de hêmanên derasayî hene jî ew ne di nisbeta çîrok an jî efsaneyan de ye. Di destanan de derasayî bi piranî di beşên destpêk û encamê de derdikevin pêş me. Lê di uslûbê van cure hikayetan de mubalaxa li pêş e. Dîsa di heqê lehengên destanê de tê gotin ku ew mirovên ne jî rêzê ne. Yanê ne şert e ku ew xwedî taybetiyên derasayî bin. Ew wekî şexs û bi kirinên xwe ne jî rêzê ne. Qedera wan, ji ya mirovên sade cuda dibe û her wiha bandora wan ya li ser civakê jî ji ya mirovên jî rêzê cuda dibe.

Di nava civaka kurd de bi vê cureyê re eleqedar gelek nav hatine bikaranîn. *Çîrok, kilam û beyt* hin ji van navan in. Tu yek ji van navan bi serê xwe ne berginda pênaseya destanê ye. Ew bi temamî li gorî forma wan ya îcrayê hatine pênasekirin. Her çendî ku hin vekoleran bikaranîna van navan ji alîyê mijar û temayan ve helsengandibin jî (Suabşî, 2023: 151-152) bi ya me li kêleka naverokê bandora forma vegêranê jî li ser binavkirinê heye. Dîsa cudabûna navên *beyt* û *klamê* jî bi heman rengî ye. Beyt bêtir ji formeke helbestî re tê gotin. Wekî ku Kaplan jî amaje pê dike; dibe ku naveroka wê bêtir firawan be û mijarên dînî jî bigire nava xwe. (Kaplan, 2022: 281) Lê eger berhemek ji alîyê dengbêjek ve bi renekî klamkî were îcrakirin hingê ji bo wê çîrok nayê gotin. Û eger mirovek sade wê bi renekî pexşankî îcra bike hingê dibe ku navê çîrokê lê bike.

Bi kurtî em dikarin pênaseyeke wiha bikin ku destan; vegotineke kevnar ya gelêrî ye, yanê anonîm e ku di heqê dîroka civakan de, di heqê bûyerên giring ku hatine serê wan de, an jî di heqê hin şexsiyetên ne ji rêzê de, ji alîyê dengbêjan ve bi renek klamkî têne gotin. Ew dibe ku di xwezaya xwe de hemî miletê eleqedar nekin, herêmi an jî şexsî bin lê bi renekî, bi taybetî jî bi rêya dengbêjan di nava hemî miletê de belav dibin û dibin hêmaneke giring ya çanda civakî.

Di pênaseyeke wiha kurt de, du taybetîyên sereke yên dirûvî û naverokî derdikevin pêş me. Ji alî dirûvî ve ew helbestî ne û muzîkal in. Lê ev ne taybetîyeke bivênevê ye. Yanê destan dibe ku hem helbestî hem pexşan be û dibe ku carina bi renek sade yanê bêyî miqam jî bêne gotin. Ji alîyê naverokî ve, taybetîya ku derdikeve pêş ev e ku; tîkiliya wan bi renekî bi hemî civakê re heye. Bûyera kakil ku dibe mijara destanê dibe ku bi jiyana hemî miletê re tîkildar be, wekî şerên mezin yên miletan, wekî koçberiyên girseyî yên miletan û dibe ku bi herêmeke taybet bi sînor be, wekî şerekî eşîrî, wekî bûyereke evînî. Lê di van cureyan de jî ew bûyera taybet, sînorê herêma xwe dişkêne û di nava hemî miletê de belav dibe.

Taybetîyeke dî ya ku di pênaseya jorîn de derket pêş me ew bû ku; ew ji alî dengbêjan/ozanan ve têne gotin. Yanê bi piranî hin kesên ku di karê xwe de pispor in derdikevin pêş me. Lê ev nayê wê wateyê ku destan bi tenê ji alî dengbêjan ve tên gotin. Bi taybetî ji alî çîrokbêj û jinan ve jî tên gotin. Ji ber ku destan ji alîyê kesên ne profesyonel ve jî tên gotin, di nava demê de di forma wan de xerabûn jî çêdibe. Eger ku mirov destanê ji dengbêjan guhdarî bike bi piranî ew menzûm e û muzîkal e. Lê dema ku mirov wê ji kesek ji rêzê guhdar bike, bi piranî destan dibe pexşan, yanê wekî rêbaza çîrokbêjiyê tê vegotin û pasajên muzîkal hema bêje hîç tune ne.

1. Destanên Kurdî

Di zargotina kurdî de cureya destanê ji berê de bi renekî berbelav hebûye û ev kevneşop hê jî zindî ye. Bêguman yek ji sedema sereke ya berbelavbûna vê cureyê hebûna kevneşopa zindî ya dengbêjiyê ye. Gelek çîrok û serpehatiyên evînî û lehengiyê ji alî dengbêjan ve hatine gotin. Hin ji van çîrokan wekî ku em ji hêmanên destanê jî fêhmî dikin ji dewrên pir berê tên û hin taybetmendîyên dîrokî girtine nava xwe û heya îro hatine. Hin jê jî em ji metnan tîdigihîjin ku di demeke nêzik de qewimîne û ji alîyê dengbêjan ve di forma helbest û stranê de hatine gotin. Hin ji van jî wekî ku teqabulê proseseke teqez ya dîrokê dikin, bûyera ku di destanê de tê vegotin xwedî tarîxekî diyar e. Lê ev nayê wê wateyê ku dîroka destanê jî bi heman rengî di dema jiyîna bûyerê de ye. Carina bûyereke diqewime û di wê demê de li serê destan însa dibe lê carina dibe ku pir piştê bûyerê destan ava bibe.

Di vê xebatê de me heft destanên kurdî ji vekolîna xwe re kirine bingeh. Ev destan bi vî rengî ne: Memê Alan, Siyabend û Xecê, Xanê Lepzêrîn, Zembîlfiroş, Cembelî û Binefşa Narîn, Derwêşê Evdî û Edûlê, Kerr û Kulik. Bêguman wekî ku ji nîqaşên li ser pênaseya destanê jî diyar e, yek dikare di heqê navê terminolojîk yên van hikayeyan de nîqaşekî zanistî bike. Herwiha hin kes dikarin îtraz li vê listeyê bikin û hemî hikayeyên lehengî û evînî ku ji alî dengbêjan ve tên gotin bixin nav vê kategoriyê ku hingê dê ev liste xwe bigihîne bi sedan. Herwiha hin kes dikarin li gorî hin krîterên dî, Rustemê Zal, Mîrze Miheme heta Kawayê Hesinkar jî di nava destanan de binivîsin. Dîsa li gorî şîroveyan hin hikayeyên ku ji alî dengbêjan ve tên gotin, wekî Bişarê Çeto, Flîtê Quto, Emê Gozê di nava destanan de bihesibînin. Hin ji vanan jî alîyê xwe yê dirûvî ve dişibin destanan hin jê jî ji alîyê temayên xwe ve dişibin destanan. Ya rast di dîroka miletan de bi hejmarek wiha zêde destan nayêne dîtin. Lê dîsa jî ev mijara nîqaşê ye ku çarçoveya vê nivîsê dibuhure.

2. Ji Alîyê Taybetmendîyên Vegêranî û Îcrayê ve Destanên Kurdî

Ji alîyê vegêrana destanî ve taybetîya herî giring îcra ye. Di îcraya destanê de gelekî alîyên dirûvî hene ku ji mekanê destanê lê tê îcrakirin heya bi taybetmendîyên helbestî û muzîkal yên destanê tê de hene. Ji bo îcraya destanan pêdivî bi hin şertên taybet hene. Şerta sereke ew e ku; destan ji alî dengbêjan ve tê îcrakirin. Yanê kesê ku destanê

dibêje, divê bi taybet pisporê vê hunerê be. Dengbêj ne ew kes e ku bi tenê dengê wî/wê xweş e, an jî ne ew kes e ku hin hikayetan dizane. Ew ji nava sîlsileyê kevnepî tê heta bingehê vê kevnepî digihîje dewrên arkaîk. Herwekî ku Albert Lord jî dibêje; di vê kevnepî de qalib û formelên giştî yên vê qadê hene ku dengbêjên hosta haya wan ji van qaliban heye û digel vê kevnepî jî xwediyê huner û afirîneriya xwe ya xwerû ne. (Vgz, Çobanoğlu, 2012:266)

Destan eger ku ji alî dengbêjan ve neyên vegotin, di forma wan de xerabûn pêk tê. Lewre ji bo destanê vegotina stranî û helbestî krîtereke giring e. Ew kesê ku destanan dibêje gava ku ne dengbêj be, pasajên menzûm û stranî bi rengekî pexşan û bêyî stran neqil dike. Ev yek jî forma vê cureyê xera dike û bêtir wê dişibîne çîrokan. Dîsa herkes wekî dengbêjan ne xwedî qabilyeta hafizayê fireh e. Herwiha dengbêj ku hafizeya wî ne fireh be jî, xwedî qalibên xwe yên taybet e û eger ku di dema îcrayê de hin pasajan jibîr bike jî derhal li dû qalibên ku di zêhna wî/wê de heyî wan valahiyan temam dike. Lê eger kesê ku îcrayê pêk tîne ne dengbêj be wê di îcaraya destanên dirêj de, gelek valahiyan bihêle, di ser gelek pasajên giring yên destanê de qebaz bide û bi vî rengî hem di forma destanê de hem jî di naveroka destanê de tehrîfatê pêk bîne.

Taybetîyêke di ya îcraya destanan ev e ku, dengbêj di her îcrayê de destanê ji nû ve însa dikin. Destanên mîna Memê Alan an jî Siyabend û Xecê gelekî dirêj in. Digel ku hafizaya dengbêjan gelek xurt e jî mimkin e ku hemî kitekitên destanê di hişê wan de nemabe. Lê dema ku ew dengbêjek xurt be ev nabe problem. Lewra di hafizeya wan de gelek qalib û model hene ku ew dikarin van li îcrayê tebtîq bikin.

Di îcrayê de ji alî meknan ve curbicuriyek heye. Dibe ku odeyek malê be, dibe ku di şeniya dawetek be, dibe ku di dîwana mîr an begek de be. Lê dengbêj bi piranî di haziriya civatekê de îcraya xwe dike (Parilti, 2006: 82-85). Bêguman dengbêj di her civatê de îcrayê pêk nayîne, meger ku ew bixwe vê daxwaz bike. An jî di demên berê de dengbêjên ku girêdayî mîr an jî began bûn hebûn, di dîwana wan de distirîn. Di îcrayên bi vî rengî de hem kesên ku guhdarî dikin û hem jî kesê ku distirê haya wan ji erka wan ya li wê derê heye. Bi rastî yên ku guhdarî dikin jî parçeyê aktîf yê îcrayê ne. Heta carina dibe ku îcra li gorî mahiyeta dîwanê an jî civatê biguhere. Wekî ku Albert Lord û Milman Parry jî balê dikêşin, her îcra ji nû ve însakirina destanê ye. Di vî jî nû ve însakirinê de li kêleka faktorên ku bi dengbêj bi xwe ve girêdayî ne, faktorên ku bi civata hazir ve girêdayî ne jî hene. Ev faktor dibe ku li ser meyla statuya civakî ya kesên ku di dîwan an jî civatê de ne be, yan jî li ser faktorên temenî, cinsî, mezhebî, dînî, eşîrî an jî hin faktorên spesîfîk be.

Dengbêj bi piranî wekî ku em di mînakên li ber destê me yên destanên kurdî de jî dibînin, bi tenê bi rengê menzûm û stranî îcraya xwe nakin. Di îcrayê de beşên neqilkirinê jî hene. Bi taybetî di destpêka destanan de dengbêj bi giştî ne bi rengê menzûm, bi pexşanî çarçoveya hikayeya xwe datînin dûre derbasî beşên menzûm-stranî dibin (Kızılkaya, 2000: 89).

Di îcraya destanan de hebûna giregirên civakî û dengbêjên reqîb, ji bo atmosfera îcrayê şertên herî baş durust dikin. Lewre dengbêj di vê derê de, hunera xwe di asta herî bilind de bi kar tînin û ji bo ku li hember giregir an jî dengbêjên reqîb, zeîf neyên xuyakirin, destanê bi şewaza herî mikemel îcra dikin. Carina dibe ku du dengbêjên hinkûfê hev bikevin ber hev. Hingê her yek ji alîyê xwe ve taybetîya xwe an jî mora hunera xwe ya şexsî li berhema zargotinî dixê ku di vê kêliyê de hem kevnepî û hem jî afirîneriya şexsî digihîjin hev û mînakên herî payeberz yên îcrayên destanan derdikevin meydanê (Parilti, 2006: 113).

3. Ji Alî Dirûvî ve Destanên Kurdî

(Kîte-Riste-Qafiye)

Destan cureyêke ji helbesta gelêrî ye. Di helbesta anonîm ya gelek mîletan de pîvana kîteyê wekî qaydeyêke giştî derketiye pêş. Di helbesta gelêrî ya kurdî de jî em cî bi cî rastî vê formê tînin. Heta hin destanên kevin, digel ku ne bi temamî be jî, mirov ji metnên li ber destê derdixê ku ew bermayên pîvana kîteyê ne lê hinekî forma wan xera bûye. Destanên mîna Zembîlfiroş û Xanê Lepzêrîn mînak in ji bo vê yekê.

“Ey meclîsa pîr zewq û xwoş---8
Guh bidene sohbetek xwoş---8
Dê key behsî zembîlfiroş”---8 (Bayezîdî, 2002: 13)
Ev jî mînakek ji Destana Xanê Lepzêrîn:
“Xurmîn e ha xurmîn e---7
Qesta Xanê Çengzêrîn e---8
Ew jî rast e derew nîn e.”---8 (Cindî, 2016: 157)

Beyta pêşîn ku destpêka Destana Zembîlfiroş e, hemî risteyên wê ji heşt kîteyan pêk tên, di beyta duyemîn de ku destpêka Destana Xanê Lepzêrîn e, risteya wê ya pêşîn ji heft kîteyan û herduyên duyemîn ji heşt kîteyan pêk tên. Ev rewş ji bo herdu destanan jî heya dawiya destanê bi vî rengî ye. Yanê di pîvana kîteyê de ji sedî sed îstîqrar tune ye. Carina du riste heşt kîte û carina yek jê yan heft kîte yan jî neh kîte yan jî ew jî heşt kîte dibe. Lê ji van destanan mirov têdigihê ku pîvana heşt kîteyî di piraniya destanê de serdest e. Herwiha divê em destnîşan bikin ku giringiya pîvana kîteyê bi estetîka an jî harmonîya/ahenga vegotinê re têkildar e. Lewma dema ku ji aliyê kîteyê ve di vir de kêmasîyek derkeve pêş me divê em bizanin ku dengbêj bi rêya vegotina muzîkal dikarin vê kêmasîyê ji holê rakin.

Herçendî ku di hin versiyonên cuda yên van herdu destanan de carina formên cuda derdikevin pêş me jî hema bêje hemî varyasyonên Zembîlfiroş bi vî rengî li gorî pîvana kîteyî û ji bilî beyta pêşîn, hemî beytên di li ser çar risteyan e. Lê di risteyan de heman îstîqrar ji bo Xanê Lepzêrîn tune ye. Beyta destpêkê bi sê risteyan dest pê dike û di nava metnê de carina dibe çar riste carina jî pênc riste.

“Şah go:-Bikin, bilezînin
Qursên zêran ji mal derînin
Nav legana bihelînin
Milê xanê min bikşînin” (Cindî, 2016: 160)

Di vê beyta jorîn de riste çar in lê di vê beyta jêrîn de vîcarê vedigere pênc risteyan:

“Xan hespê xwe teriqandin
Çîya û banîyan gerandin
Devê behra diçêrandin
Xan wê derê berek dîye
Wî berî heyrî maye.” (Cindî, 2016: 158)

Herwiha di piraniya varyantên Xanê Lepzêrîn de, hemî destan yekser bi awayê helbestî nîne. Cî bi cî beşên pexşan dikevin navberê.

“Xan di şivanek li wê derê bû. Çû cem şivîn. Şivan razabû. Go: “Gune ye”, dey lê nekir go: “Bira xewa xwe hilîne, em tevayî bixun.” Şivîn tasa xwe tîjî şîr kiribû.....” (Cindî, 2016: 158)

Digel ku li gorî destanên di Zembîlfiroş ji aliyê dirûvî ve bêtir bi îstîqrar e jî heman wesfîyetên formî di wê de jî derdikevin pêş me. Wekî mînak, di deqên Miradxanê Bazidî de, ku di pirtûka Gîw Mukriyanî sala 1976an de hatine çapkirin, versiyonek wekî ku me li jorê mînak da her beyt jî çar risteyan pêktên lê di versiyonên di de her beyt jî du risteyan pêktên. Wekî mînak:

“Zembîlfiroş kurî mîran e
Xudana koçik û dîwan e

Şev û roj keyf xoşî ye
Çi acizî di dil de niye

Şevêkî şevî tîni bû
Le naw xewê de girî bû.” (Mukriyanî, 1976: 70)

Di gelek varyantên di yên Zembîlfiroş de em dibînin ku cî bi cî, beşên pexşan dikevine navê. Carina vebêj, di destpêkê de bi rengê pexşanî vedibêje û dûre dibêje ev jî “Beyta Zembîlfiroş e” û vê carê dest pê dike bi awayê helbestî û bi meqam dibêje. Wekî mînak:

“Zembîlfiroş xortekî feqîr î, belengaz bû. Bacêr da ji xwe ra selik difrotin, pê wê karê zarê xwe xuey dikir. Rojekî jî selikê xwe hilda, soqaqêra çû, çû ber mala mîr ra derbaz bû..... Du cariya da pey hev, çûn cem Zembîlfiroş, gotin:

“Zembîlfiroş, lawkê delal
Te sineta selkê du al,
Hinek husnê Êsif li bal.” (Evdal-Cindî, 2016: 393)

Sebebê ku Destana Zambîlfiroş li gorî yên di bêtir bi pîvana kîteyî re girêdayî ye, bi temamî ne aşkera ye lê em dikarin çend şîroveyan di vê barê de bikin. Yek jê, ev destan ji çanda medrese û tekyayê tê û transmîsyona wê bêtir bi

rengê nivîskî bûye. Yanê ji ber ku di çanda medreseyê de xwendin û nivîsandin bêtir li pêş bû, feqî û melayên li wê derê destanê ji tekstên nivîskî hîn kirine û bi giranî ji forma wê re sadiq mane. Ji aliyek dî ve argumanek dî ku piştgirî dide vê îdîayê ev e ku ev destan ji xwe di tradîsyon û repertûara dengbêjan de zêde ne populer e. Yanê ji ber ku forma wê bi zexmî girêdayî hin qaîdeyan e, dibe ku dengbêjan xwe jê dûr xistibe. Lewre di hunera dengbêjîyê de serbestiya li ser awayê vegotinê xaleke giring bû.

Herwiha argumenteke dî ev e ku, ev destan ji demek pir berê yanê nêzikî ji 400 salan vir ve, bi rengekî nivîskî ji alî Feqiyê Teyran ve hatiye nivîsandin û dibe ku bandora wê versiyonê li ser hemî yên dûmahîkê çêbûbe û bi vî rengî di forma wê de li gorî destanên di yên kurdî sabîtbûnek cihêreng çêbûbe. Ev fenomen, di kevneşopa edebiyata klasîk de, di destanên di yên cîhanê de bi berbelavî derdikeve pêş me.

Lê heman îzah ji bo Kela Dimdim ne li cih e. Wekî ku tê zanîn Destana Xanê Çengzêrîn, ji alî dengbêjan ve tê gotin. Ew bi temamî destanekî lehengiyê ye ku ji her aliyê ve li gorî tradîsyona dengbêjîyê ye. versiyonên herî kevnar yên nivîskî yên wê destanê ji alî Ordîxanê Celîl ve hatine tomarkirin. Lê dîsa jî balkêşiyê berbiçav e ku forma wê destanê li gorî destanên di yên kurdan hinekî cuda ye. Ordîxanê Celîl di heqê forma destanê de wiha neqil dike:

“Di nava gelek versiyonên destanê de, yên menzûm, yên pexşan û yên tevlihev hene; di versiyonên destanê yên menzûm û yên pexşan û yên têkilhev de jî, metnên menzûm û pexşan li dû hev tên. Di versiyonên menzûm û têkilhev de, metnên menzûm her tim wekî stran tên xwendin. Di versiyonên ji hev cuda de bi piranî fratmentên ku wek stran tên xwedîniyê hev û carina hema bêje herf bi herf eynî ne. Ji ber vê rewşê em dikarin bibêjin ku di destpêkê de Destana Xanê Çengzêrîn bi tenê di forma menzûm de bûye, ji bilî wê bi taybetî beşên ku wekî stran tên xwendin dibe ku forma herî qedîm ya destanê bin û bi vî rengî heya îro hatibin.” (Celîl, 2016: 33)

Wekî ku me li jorê jî neqil kiribû, ji bilî van herdu destanan, tu destanên di di forma xwe de wiha bi cihêrengiyek dernakevin pêş me. Ji bo Destana Zembîlfiroş me şîroveya xwe kiribû lê ji bo Dimdim, heman şîrove ne li cih e. Lê di vê derê de em dikarin şîroveyek dî bikin ku, ev destan ji herêma Kurdistan Rojhilat derketiye. Erdnîgariya bûyerên destanê, herêmên derdora Gola Êrmiyê, wekî Têrgewer, Mêrgewer û Bradost in. Her çendî ku şîroveyek dûr be jî dibe ku di teşekula prosesê vegêrana destanê de, bandora helbesta lorî û hewramî peyda bûbe ku ev tradîsyon digihîje berîya îslamê. Lewre di helbesta lorî de, qaîdeya kîteyê û çarînan an jî beytan qaîdeyê berbelav e. Dibe ku di prosesê teşekula destanê de, ev yek bi bandor bûbe (bnr. Valî, 2021: 25). Herwiha sedemeke dî yê muhtemel ev e ku ev destan jî ji alî Feqiyê Teyran ve hatiye nivîsîn. Lê di versiyona Feqiyê Teyran de, temaya destanê bêtir li ser şerê mezhebî ye. Yanê şerî şe û sunîtiyê.

Ji bilî van herdu destanan, hemî destanên di yên kurdî, ji aliyê şeklî ve bi heman rengî ne. Ya rast li vê derê ya ku dirûv dide destanan, ji dînamîkên helbestî bêtir, dînamîkên muzîkal in. Di herdu destanên di de, yanê Zembîlfiroş û Kela Dimdim de, ji dînamîkên muzîkal bêtir, dînamîkên helbestî li pêş bûn. Wekî, kîte, riste, qafiyê û hwd. Sedema wê jî me li jorê li dû şîroveya xwe îzah kiribû.

Destanên mîna, Memê Alan, Siyabend, Derwêşê Evdî, Kerr û Kulik û Cembelî, hema bêje hemî di forma menzûm û pexşan de ne. Yanê tu yek ji wan bi temamî ne helbestî û bi temamî ne pexşanî ye. Di nava van destanan de, ya ku herî zêde forma xwe ya menzûm xera kiriye, Destana Siyabend e. Ev destan li hin deveran bi temamî vegeziyayî forma pexşanî û wekî çîrokek tê gotin. Herwiha heman rewş ji bo Destana Memê Alan ji bi vî rengî ye.

Li vê derê em ê di nava van her pênc destanan de dabeşkirinek spesîfik bikin da ku em ji aliyê analîzê ve hinekî rihetir bibin.

Ji van her pênc destanan, destanên Derwêşê Evdî, Kerr û Kulik û Cembelî ji hin aliyên ve dişibin hev û du. Yek ji hevbeşiya wan ev e ku; bi qandî ku mirov ji metna wan tê derdixê hersê jî teqabulê dîrokeke nêzîkî dikin. Digel ku tesbîtkirina dîrokeke teqez ji sedî sed ne mimkin e jî. Dema ku em metna destanan dixwînin, ji awayê vegotinê, ji nebûna hemanên fantastîk û ji tarîfên rewşa civakî ya wê demê em têdigihên ku ev destan teqabulê demeke nêzîkî dikin.

Yek ji hevbeşiya van hersê destanan hebûna zêde ya hemanên civakî ye. Kategorîzasyona eşîrî ya civaka kurd, realîteya zozan û beriyê, di nava van têkilîyan de şerên eşîrî û pê ve girêdayî lehengiyên ku diqewimin bûne bingeha van hersê destanan.

Lê di Destana Siyabendê Silivî û Memê Alan de rewş hinekî diguhere. Digel ku di hin pasajên Siyabend de em rastî heman realîteya destanên di tên jî, bi giranî ev destan û Memê Alan, teqabulê demeke dûrtir dikin. Lewre di wan de motif û hêmantên fantastîk li gorî destanên di bêtir derdikevin pêş me. Lê ev cure klasîfikasyon, ne bi tenê naverokî ye, di heman demê de dirûvî ye jî. Bêguman, em ê di vê barê de, di sernavên di de bêtir tiştan aşkera bikin.

Di pirtûka Qanatê Kurdo, Mem û Zîn, Duwanzde varyant de, hemî varyantên Memê Alan, hem menzûm hem

pexşan in. Yanî têkel in. Varyantên di pirtûka Heciyê Cindî, Folklorî Kurmanciyê û Celîlê Celîl-Ordîxanê Celîl, Zargotîna Kurdan û di pirtûka Sadiq Bahaeddin Amêdî, Folklorî Kurdî de jî, hemî varyantên Memê Alan bi heman şiklî ne. Carina em li hin varyantan rast tînin ku bi tevahî pexşan in, lê tu varyantek ku bi tevahî menzûm be li ber destê me tune ye.

Bêguman li vê derê divê em behsa îstîsnaya Memê Alan a Roger Lescot bikin. Di vê varyantê de, destan ji destpêkê heya dawiyê menzûm e. Lê divê em ji bîr nekin ku ev varyant bi şiklê ji alîyê Roger Lescot ve ji nû ve hatiye organîzekirin. Yanê wî gelek varyantan aniye cem hev û bi rêya ji hev temamkirin, varyantake nûh derxistiye meydanê. Lewre, ev varyant varyanteke mudaxelekirî ye. Ev rewş jî qîmeta wê ya ji bo lêkolînên zanistî, kêmtir dibe.

Destana Siyabend, bi rengê balkêş di forma çîrokê de dest pê dibe. Ev destan, bi avahiya xwe hinekî ji destanên di cuda dibe. Destana Siyabend bi vî rengî dest pê dibe:

“Hebû, qe ji Xudê mestir tinebû, Ahmed û Mihemed birayê hev bûn, jina Ahmed bi zaro bû. Şeş mehê wê qedîyan, Ahmed mir. Divê, neh meh û neh rojê wê qedîyan, Xudê kurek dayê, navê wî danîne Siyabend..... Siyabend kurekî ze’f delal bû, lê emrê Xudêda serê wî gurî bû û navê wî danîn Gurî.” (Celîl, 2013: 104)

Wekî ku em ji vê destpêkê jî dibînin, destan di forma çîrokê de dest pê dibe. Lê di destanên kurdî de ev taybetmendî bi berbelavî derdikeve pêş me. Eger ku destan bi temamî veneguherîbe forma pexşanî ev yek ne problem e. Lewre dengbêj jî bi piranî dema ku dest bi xwendina destanan dikin, di destpêkê de bi hikayeyê dest pê dikin, yanê çarçoveya bûyeran ji pêşî de neqil dikin dûre bi taybetî di beşên diyalog an jî di beşên ku asta lehengiyê bilind dibe de, bi stranî dixwînin. Di van beşên klamkî de her tim qafiyê heye. Her wekî vê mînakê jêrîn ji Destana Siyabend û Xecê:

“Gurî go: Here lê, jingavanê dilê min li bête,
Bila têkeve dilê te r’ema Xudê ye
Tu bide min hinek nanê tûrê, mehîra e’lbête,
Ez ji birçîna mirim îro şeş roja li ser sergoyê rêxêye.
Wî, wî, wî Gurîkayê mi bî.

Jina gavan dibê: Herê lo-lo, lo-lo,
Lo – lo Gurîyo, dilê min li bête,
Mêş û kêşê dora serê te,
Rîya min nakin ko ez herime malê ye,
Tu vêga bimirî ser sergoyê rêxêye
Te te’ m nekir nanê gavaniyê, mehîra e’lbête
Wî, wî, wî Gurîkayê mi bî.” (Celîl, 2013:105)

Di Memê Alan de jî heman tişt derdikeve pêş me. Yanê di destpêkê de dengbêj/vebêj çarçoveyê giştî ya hikayeta xwe dide û ev beş bi kurtî ye:

“Memê kurê Al-Paşa bû, Al Paşa, paşayê şehê Muxurzemînê bû. Al Paşa jina xwe gelekî mezin bûbûn, ewled-t’ewledê wan Memê tenê bû. Ewana gelek ji Memê xweyî delal hiz dikirin...” (Celîl, 2013: 26)

Ev reng destpêk di piraniya destanên kurdî de heye. Dengbêj bi vê destpêkê girîzgaheke nerm ji bo destanê dibe. Lewre destan dirêj in û kêliyên şikestinê kêliyên trajîk tê de gelek in. Dengbêj jî yekcarî de bi trajediyê dest pê nakin. Ew bi destpêkek bi vî rengî herwiha civata hazir jî ji prosesên di yên destanê re amade dikin.

Piştî ku dengbêj bi vî rengî çarçoveya hikayeya xwe datîne, bi piranî beşên menzûm dest pê dikin ku di vanan de qafiyê heye:

“Xwedêyo, tu bikî ferware,
Lîbasekî kewotka bikî xare,
Em sisêne, Xatûn Zîna delal bive çare.” (Celîl, 2013:27)

Ev pasaj hema bêje bi heman rengî di gelek versiyonên Memê Alan de heye. Jixwe tê zanîn ku di destanan de beşên menzûm muhtemel e ku beşên herî kevnar yên destanê bin. Lewre pasajên menzûm her tim li hember guherînan zêdetir li ber xwe didin. Wekî mînak:

“Ay rebî tu bikî ferware
Zîna Mîr Sêvdîn ser me bikî çare
Post jor da têne xware.” (Kurdo, 1996: 28)

“Ya rebî tu bikî ferware,
Postekî kevtoka ji jor da bikî xare,
Em sisêne, şîrîn xatûn Zîne ser me bikî çare.” (Kurdo, 1996: 142)

“Ya rebî bikî ferware,
Postekî kevtoka bîn xare,
Em bi xwe sisê ne-
Zîne ser me bikî çare.” (Kurdo, 1996: 177)

“Xwedêyo tu bikî ferware
Libsê kevtokê bikî xare
Em sisê ne, Zîne bi me ra bikî çare.” (Kurdo, 1996: 211)

Di destanên Siyabend û Memê Alan de pîvana kêteyî hema bêje qet tune û herwiha di risteyan de jî îstîqrar tune. Yanê carina 8-10 riste wekî malikek li dû hev tîn û carina jî 3-4 riste. Ev yek bi temamî li gorî keyfiyeta vebêj an jî dengbêjan e. Lê wekî ku di hemî destanên di yên kurdî de tê dîtin qafiye her tim heye. Qafiye carina bi yek herfi carina bi du herfi an jî zêdetir e lê ev yek bi piranî li gorî qaîdeyên muzîkê ye.

“Herê Zîne hoye min hoye
Ezê nav Cizîrê da deynim kaşholoye
Yekî bivin eva ji te ra Memo ye

Go: Brao koşka bavê min mezin e
Belkî top lêkeve welgere ji bine
Kê dîtiye girtiyê hevsa berda jine

Go: Brao çiqas cindiyê Cizîra Botane
Hemû li cem min bav û biran e
Xêncî nefsa Memê Alane.” (Kurdo, 1996: 207)

Di vê pasajê de tê dîtin ku qafiye di nava hemî risteyan de heye lê her ku axivêr diguhere, di nava axaftina wî/wê de wechê qafiyeyê jî diguhere. Herçendî ku berhevkar ji hev cuda nekiribe jî em dikarin vê pasajê li gorî xwediyê axaftinan ji hev malik bi malik cuda bikin û hingê her malik dibe sê riste. Di nava her neh risteyan de jî qafiye bi yek herfi heye (me li jorê bi rengê kesk nîşan daye) lê dema ku sê riste bi serê xwe bêne analîzkirin wekî ku di destpêkê de derdikeve: “...oye, ...oye, ...oye”, qafiye bi vî rengî dibe qafiyeyeke dewlemend û ji sê tîpan pêk tê. Ev rewş ji bo herdu malikên di jî bi heman rengî ye. Lê divê em bi bîr binin ku ev ne karakterîstîkeke destanên kurdî ye. Ev mînak jî ji Destana Siyabendê Silivî:

“Siyabend dibê: Hû lê – lê, lê, hû lê – lê, lê
Xeca min lez ke bilezîne
Zîne Erzerûmî bi heft tanga li ser piştta Deybilqiran bişidîne
Cilê mi li xwe ke şûr û mertalê mi girêde
Xwe fêriz û palewanî bixemilîne
Lingê xwe têxe rikêba Deybilqiran suwar bibe û bilezîne
Berê xwe bide rîya Elcewazê û bixarîne
Xwe bi bajarê Elcewazê bigihîne

Gava ku ketî nava e'lemê çe've xwe li xorta bigerîne
Xortekî ji mi çêtir ji xwera bibîne
Ku Xudê kurekî da te navê wî Qeregêtranê salê dîne
Gava tu wî têxî dergûşê wî bihejîne, wî bimijîne
Ji xora hêdî li serê bilorîne
Carê navê Siyabendê xweî Silivî di bîra xweda bîne
Xecê, e di bexta te da tu xwe bernedî
Dinya ronaye, ruh' şêrîne” (Celîl, 2013: 133)

Di vê pasaja jorîn de, bi tenê di risteya çaran û risteya panzdehan de û di risteya destpêkê de qafiyê tune ye lê di hemî risteyên di de qafiyê bi “...îne” çêbûye.

Di destanên wekî Kerr û Kulik, Derwêşê Evdî û Cembeliyê Kurê Mîrê Hekaryan de jî rewş kême zêde bi vî rengî ye. Yanê di destpêkê de ew menzûm û peşan têkilhev in. Lê divê em vê bibêjin ku ev hersê destan ji ber ku di nava dengbêjan de li gorî van destanên jorîn bêtir populer in, forma wan ya menzûm zêdetir li pêş e. Ji vê yekê em dikarin vê tesbîtê bikin ku eger destan di nava dengbêjan de popularîteya wê kême bibe, hingê di forma wê de jî xerabûn çêdibe û her ku diçe vediguheze forma peşanî û dibe wekî çîrok. Bi taybetî di Destana Memê Alan û Siyabend de ev yek aşkera ye. Lê digel ku ne mijara me ye jî divê em bibêjin ku, du çîrokên ku di nava civaka kurd de pir populer in lê dengbêj wan wekî destan naxwînin, êdî taybetmendîya xwe ya destanî bi temamî hunda kirine û bûne çîrok. Ev herdu çîrok ev in: Mîrze Miheme û Rustemê Zal (îstîsnaya Rustemê Zal li herêmên rojhilatê Kurdistanê û herêmên Kafkasyayaê heye ku di forma helbestî de ye). Ev herdu berhemên folklorî, muhtemel e ku di demên kevnartirîn de ji alî dengbêjan ve dihatin xwendin. Lewre ji temaya wan, ji însaya hikayeya wan em têdigihên ku ew ji sînorê çîrokek dibuhurin û bêtirî wekî du lehengên gelêrî tevdiagerin. Lê forma wan bi tu hawayî naşibe forma destanan û ew êdî wekî metnên çîrok li pêş me ne. Lewra ew li gel dengbêjan êdî ne populer in û forma wan xera bûye. Li ser sebebê vê ketinê mirov dikare analîzek wiha bike ku, ji ber ku di naveroka wan de bûyerên fantastîk pir in, parçeyekê mîtolojiya kevnar in, dibe ku dengbêjan, ji ber ku xwendina tiştên bi vî rengî dê rêzdariya wan kême bike, xwe jê dûrxistibin. Lewra hem dengbêj û hem jî civata ku dengbêjan guhdarî dike, bi piranî ji metnên ku ew dixwînin bawer dikin û wan wekî rastîyeke dîrokî dibînin. Hebûna hêman û motîfên fantastîk di nava wan herdu hikayetan de, bûye sebeb ku dengbêj xwe ji wan dûr bixin.

Destana Kerr û Kulik jî eynî wekî Siyabend û Memê Alan bi hikayekirineke kurt dest pê dike lê hemen piştî vedigere forma menzûm:

“Waxtekî, zemanekî du bira hebûn. Li kî derê? Beriyê. Erdê kî ye? Erdê Erebestanê ye. Du bira hebûn; Îsê Mîr, Eliyê Mîr. Eliyê Mîr yê piçûk bû, Îsê Mîr yê mezin bû. Eliyê Mîr emrê Xwedê bi cî anî. Navê kurê Elî jî Silêman bû.” (Gültekin, 2013: 96)

Di vê destanê de ji ber ku asta lehengiyê zêdetir li pêş e, pasajên menzûm jî bêtir derdikevin pêş me. vebêj, cî bi cî bûyeran hikayê dike lê pêre derbasî stranê dibe:

“Erê go, Îsê rabe ji xewêye
Bavê min lêxin defa hewarêye
Gelo go rabe, lêxe defa hewarêye
Sedbistpênc mêrê bokeberan bîne alîyê odêye
Fincanê dayne ser tablêye
Zerfa li ser table, table li ser masêye
Kî here bîne Bilêcana Eliyê Salaye
Ezê bidimê Perîşanê bi heft qûweta Xwedêye
Herd kurê Wardê mîna rûvîkî têxe telêye
Emê bişînine ser êla xalaye
Çûyin di dest wan, hatin li dest Xwedêye
Bira konê wana mîrate bimîne hêviya xelqêye.” (Gültekin, 2013: 100-101)

Herwekî ku em di vê pasajê de jî dibînin, tu standareke hejmara risteyan û pîvana kêteyê tune ye lê qafiyeya “...êye” wekî qafiyeya dewlemend tê dîtin. Di piranîya destanên kurdî de qafiyeyên bi vî rengî tene dîtin: “...îne, ...ane,

...êye, ...êyo, ...oye” Lewre ew li gorî meqamên muzîkê ji bo dengbêj wekî pêdiviyekê derdikevin pêş. Wekî mînak ev pasaj ji Destana Cembelî ye:

“Dilê min dibêyo sed car dibêyo

Derwêş Axa axayê êlê yo

Vê sibê me dî kareke xezalan hate kete mala apê mino

Min nizanibû ew kara xezala kê yo.” (Cindî, 2016: 67)

Ev pasaj jî ji Destana Derwêşê Evdî ye:

“Derwêş dibêje bila bi soza mêrane

Gava ku mi bi xêr û xweşî jêkir serê Çilosmane

Ezê te jî biherim belê bikim kebaniya mala di girane

Ewan herduya soz bi hev ra dane.

Ewan zilaman jor da daketin ser rê û dirane

Ewana sê roja hajotin bi rê dane.” (Uluçay, 2012: 249-250)

ENCAM

Ji ber berbelavbûn û hê jî zindîbûna kevneşopa dengbêjîyê, cureya destanê di nava civaka kurd de, li gorî civak û milletên dî hîn bêtir dewlemend e. Ev yek bêguman di curbicuriya tema û forman de jî bandora xwe nîşan dide. Û ev rewş jî di heqê çanda civaka kurd de fikrekê dide me.

Ev curbicurî ji aliyê formê ve jî bi heman rengî ye. Di hin destanan de, wekî Kela Dimdim, Zembîlfiroş, me dît ku ew bi giranî bi pîvana kîteyê ve girêdayî ne. Lê di hin destanên dî wekî, Memê Alan, Siyabend û hwd, tu nîşaneyên pîvana kîteyê dernekete pêş me. Ji bilî Zembîlfiroş di tu destanê de hejmara risteyên di bendekê de ne sabît bûn. Di Zembîlfiroş de di bendekê de hejmara risteyan yan çar yan jî sisê bû. Di hemî destanê dî de ev rewş li gorî keyfiyeta taybetmendiyên muzîkalîteya dengbêj diguherî. Lê pîvana qafiyeyê di hemî formên cuda de jî bi rengekî sabît tê dîtin.

Herwiha hema bêje di hemî destanan de menzûm û nesir têkel bû. Bi piranî di pasajên ku îzahat tê kirin de nesir li pêş bû. Lê di dîyalogan de, di pasajên ku asta evîn û lehengiyê li jor e de, vegotina menzûm û stranî teqez li pêş e.

ÇAVKANÎ

- Artun, Erman. *Türk Halk Edebiyatına Giriş*. Adana: Karahan Kitabevi, 2001.
- Atî, Hikmettin. *Lêkolîneke Folklorî Li Ser Destana Mem û Zînê. (Teza Neçapkirî)*. Mêrdîn. 2013.
- Bayezîdî, Muradxan. *Kovara Nûbihar, Hejmar:87. (Tîpğuhestin: Xalid Sadîni)* İstanbul: Nûbihar Yayınları. 2002.
- Boratav, Pertev Nailî. *Halk Hikayeleri ve Halk Hikayeciliği*. İstanbul: Adam. 1989.
- Celîl, Ordîxanê. *Bir Kahramanlık Destanı. Dimdim*. Werg: İbrahim Kale, İstabbul: Avesta. 2001.
- Celîl, Celîlê-Celîl, Ordîxanê. *Zargotina Kurda I*. Diyarbakır: Aram. 2013.
- Cindî, Heciyê. *Folkloru Kurmanciyê*. Diyarbakır: Lîs. 2016.
- Mukrîyanî, Gîw. *Çîrokên Zembîfiroş, Deqê Miradxanê Bazîdî*. Suleymanî
- Çobanoğlu, Özkul. *Halkbilimi Kuramları ve Araştırma Yöntemleri Tarihine Giriş*. Ankara: Akçağ. 2012.
- Erbay, vecdî. *Bir İnatçı Bahar*. İstanbul: Ayrıntı. 2012.
- Felix J. Oinas. *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar 3*. Ankara: Geleneksel. 2015.
- Gültekin, Mehmet. *Zargotina Kurdên Serhedê*. İstanbul: Avesta. 2013.
- Kaplan, Yaşar. *Helsengandinek Li Ser Cureyên vegêranê Yên Di Folkloru Kurdî De, International Journal of Kurdish Studies (IJOKS)*. 8(2). 2022.
- Kızılkaya, Muhsin. *Kayıp Diwan*, İstanbul: İletişim. 2000.
- Kurdo, Qanatê. *Mem û Zîn, Duwanzde Varyant*. Stockholm: Roja Nû. 1996.
- Keskin, Necat. *Folklor û Edebiyata Gelêrî*. İstanbul: Avesta. 2019.
- Subaşî, Kenan. *Fesad û Bêbext Di Trajedîya Evîne Da: Weku Nimûne Destanên Evîne Yên Mêjûyî*. Mukaddime 14 (Özel Sayı) r. 148-176. 2023
- Lord, Albert B. *The Singer of The Tales*. Newyork: Harward University Press. 1971.
- Parîltî, Abidin. *Dengbêjler Sözüün Yazgısı*. İstanbul: İthaki. 2006.
- Sadîni, Xalid. *Feqiyê Teyran*. İstanbul: Nûbihar. 2020.
- Uluçay, Ömer. *Destana Derwêşê Evdî*. İstanbul: Dîwan. 2012.
- Valî, Shahab. *Rustemê Zal û Heft Xana Wî*. İstanbul: Avesta. 2021.
- Wikander, Stik. *Antolojiya Tekstên Kurdî. Herekol Azîzan, Hawar 13 (1932)*. Stockholm: Orfeus. 1996.

Extended Abstract

In this study, we aimed to examine the seven Kurdish epics in terms of their form. The aim of our study was to make a theoretical discussion about the concept of epic conceptually and to identify the formal features of these epics. Efforts to define and classify folklore types have continued since the birth of this discipline. Although there is no ongoing debate regarding the definition of certain species and their forms and contents, this conceptual debate regarding some species still continues. The dynamic and variable nature of these species on the temporal plane saves this discussion from a vicious circle, and it seems that the discussion on the species improves the scientific field.

Epic, as a genre, has long been the most popular and most studied genre among folk literature genres. The reason for this is, of course, related to the response the epic genre receives in society. Although this interest has historical and social aspects, it also has a literary and aesthetic side. The society has transformed this type of narrative into an identity area for itself and reflects its feelings about past events and imaginations about the future. This narrative tradition is very popular within the Kurdish society and has become the main narrative genre of the dengbej tradition. Divanxanes, village chambers or assemblies established under large tents are the main places where this tradition is performed, and the bards who continue this tradition here have always been respected in the society. Poetry and musicality, which are one of the formal aspects of this genre, are the issues that dengbejs pay most attention to, and they have tried to leave other rival dengbejs behind with the skill they show in this field.

The seven main narratives we selected while examining Kurdish epics are as follows: *Memê Alan Epic*, *Siyabend û Xecê Epic*, *Kela Dımdım Epic*, *Zembîlfiroş Epic*, *Derwêşê Evdî û Edûlê Epic*, *Kerr û Kulik Epic* and *Cembelî û Binevşa Narîn Epic*. Of course, there are many narratives in Kurdish folk literature that are similar to the narratives we have chosen in terms of form or subject and themes. In fact, their numbers can even reach hundreds. However, it would be wrong to consider all of these as epic. Although some of these resemble epics in form, they do not resemble epics in terms of subject and theme or other narrative issues. Although some of them are close to epic in terms of subject and theme, they have lost their epic features in form. In any case, it is unusual to come across hundreds of epics within the folk literature tradition of a society. Additionally, when we look at the narrative preferences of dengbejs, we will see that they do not approach all of these narratives in the same way. In short, partial additions and deletions can be made to the seven epics we have examined here, depending on the researchers' definition of epics, but this cannot be in the form of not seeing any of them as epic or adding dozens more narratives to them.

While examining the Kurdish epics formally in our study, we determined that all the narratives we examined were either entirely in verse or a mixture of verse and prose. Considering the fact that this situation is a basic characteristic of today's epic tradition, we have seen that it also fits the narrative techniques of dengbejs. While folk poets perform long genres such as epics, it is obvious that they cannot convey them all musically from beginning to end. It is common for these narratives to resort to direct narration at certain points in the beginning and in the middle, in order to relax, to rest their voice, and to slow down the tempo of the narrative, to convey the events in a conversational manner, and even to have some people in the assembly intervene, and it also adds variety to the narrative.

Another formal feature we tried to examine was the features in terms of rhyme, line and syllable measure. While examining it in the context of rhyme, line and syllable measure, we saw that the most basic characteristic we identified was the freedom in these areas. Although we saw that there was a strict adherence to this principle, especially in terms of rhyme, we found that there was no standard in terms of syllable measures and number of lines. We found that rhyme itself can vary between simple rhyme and rich rhyme, but especially the rich rhyme type, which consists of the rhyme of three letters, is common. We determined that the most fundamental dynamic in rhyme formation is related to the musical side of dengbej tradition. In a way, narrative tradition also determines the formal characteristics of the genre. Again, the quantitative richness of the representatives of the narrative tradition also points to the richness of the genre's formal features.

We have determined that some of the narratives mentioned above adhere to this measure in terms of syllable meter. Especially in the Epic of Zembîlfiroş and the Epic of Kela Dımdım, we saw that they adhered to the syllable measures compared to other narratives. However, we have not seen any standard of syllable measures in the Memê Alan or Siyabend û Xecê epics. We tried to explain the reason for this with two different interpretations. For the Epic of Zembîlfiroş; Considering that this epic is an epic that is shaped mostly around the medrese culture and whose moral and didactic aspects come to the fore, we have seen that the genre has achieved formal standardization due to the tradition of devotion to writing. We interpreted it as the dervishes or denbejs who performed this narrative conveyed it from the written text. For this reason, both the number of lines and the measures of syllables are preserved to a significant extent in this narrative. We determined that the syllable measures are 8 or 7 syllables, and in terms of the

number of lines, a double couplet formation or a quatrain formation consisting of four lines is formed.

In the Kela Dımdım Epic, with a different interpretation from Zembîlfiroş, both the region where the events in this epic took place and the region where this epic occurred are the same region, Mukrîyan and Bradost regions. This region is influenced by the Hewraman region and a tradition of oral and written poetry, albeit religious, has been formed. The oral poetry tradition here has been standardized in terms of syllable measure and number of lines and has survived for centuries throughout history. It is likely that this oral and written poetry tradition influenced the epic performers and ensured the standardization of the first versions of the epic.

We have determined that the other epics that are the subject of our review were born and developed in a different tradition, and within this tradition, other formal features other than rhyme gained a freer quality rather than being confined within a certain pattern.

As a result, the conceptual discussion we conducted regarding the epic genre in this study and the formal characteristics of Kurdish epics we tried to identify contribute to the ongoing scientific discussions and studies in the field.